# Belavok ji bo serperiştên guhdanê di dozên guhdanê de

## 1. Giştî

Tu bi wergirtina karê guhdanê erkekî niştîmanî yê giring bi cih tînî. Tu karekî xwebexş diavêjî ser milên xwe, ku pêdivî ye tu bi wijdan û bi hestekî berpirsiyane û bi tenê ji bo berjewendiyên kesê/kesa pêdivî bi guhdanê pêk bînî.

Şert û mercên qanûnî li ser guhdanê di madên qanûnî §§ 1882 / 1888 de ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) hatine birêzkirin.

Li gorî § 1888 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) gelek şert û mercên girêdayî guhdanê hene (§§ 1821; 1823 – 1824; 1826; 1835 – 1862; 1864 – 1867; 1870 – 1874; 1875 bendê 1; 1876 bendê 1; 1877 – 1881 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB), ku di vê çarçovê têne bi kar anîn. Em şîretê li te dikin, ku tu li van xalên qanûnî vegerî û wan baş bixwînî û fahm bikî.

Dadgeha Seratayî ya karê guhdanê çavdêriyê li ser karê te dike û şîretan li te dike, bi taybet li dema hebûna pirsgirêkên birêvebirina karê te yê guhdanê.

Eger Dadgeha Seratayî ya karê guhdanê ji te xwest, divê tu wê li ser birêvebirina karê xwe yê guhdanê agahdar bikî.

Tu li beramber kesa/ kesê pêdivî bi guhdanê berpirsî ji wan ziyanên tu sersebeb î, ku te di çarçoveya binpêkirina erkên xwe de encamdane; bi taybet li dema tu erkê xwe binpê bikî û daxwaza mafên kesa/ kesê pêdivî bi guhdanê nekî. Tu dikarî ji bo vê metirsiyê yan serencamê xwe tamîn bikî. Tu dikarî agahdariyên berferehtir li ser vê mijarê ji ba Dadgeha Seratayî ya karê guhdanê bistînî.

Divê tu wan pereyên, ku ji mesrefa kesa/ kesê pêdivî bi guhdanê re ne lazim bin, bi şêweyekî din hilgirî. Mirov dikare bi giştî yan behra bihtir baştir e, ku mirov wan pereyên zêde deyne ser hisabekî bankê li ba bankekê û têbinyeke taybet li ser ferz bike, ku ew pere werin asêkirin. Dadgeha Seratayî ya karê guhdanê dikare li gorî mada qanûnî § 1884 ji destûra bingehîn ya Almaniyayê (BGB) destûrê bide te, ku tu wan pere bi rengekî din hilgirî.

## 2. Tenê li dema guhdana kesekî ne amade

Divê tu di çarçoveya wan sînorên taybet yên ku Dadgeha Seratayî ya karê guhdanê ji te re destnîşan kirine, guh bidî hemî mijarên girêdayî milk û malê kesa/ kesê ne amade û te destûr heye li dema ne amadebûna wê/wî nûneratiya wê/wî di wan mijarên girêdayî karê xwe de bikî.

## 3. Bidawîbûna karê guhdanê

Karê guhdan bi dawî tê

a) eger Dadgeha Seratayî ya karê guhdanê karê guhdanê betal bike,
b) li dema ku guhdan ji bo encamdana karekî taybet hatibe dirustkirin, bi dawîbûna wî karî,
c) li dema karê guhdana ji bo keseke/kesekî ne amade, bi rewabûna biriyara li ser daxuyaniya mirinê yan tesbîtkirina dema mirinê.